

Zarokên gundê Gozliyê digel êrişan jî perwerdeya xwe didomînin



Gozliyê û gundên derdorê dike. Ji mamosteyên dibistanê Sultana El-Elî got, tevî ku me dibistan vekirî ye, ji ber ku nêzî eniyên şer e fikarên me hene. Gelek caran gundê Gozliyê û yên derdora wê ji aliya artêşa tirkî ya dagirker û çeteyên wê ve tê toparankirin da şênîyan bidin koçberkirin. Sultana El-Elî diyar kir ku şênîyên gundên derdorê zarokên xwe naşînin dibistanê. Dîtîstin ku ji aliya artêşa tirkî ya dagirker û çeteyên wê ve were toparankirin.

Dibistana gundê Gozliyê yê li nêzî herêmên di binê dagirkeriya Tirkîyê û çeteyên wê de, dibe hedefa êrişan. Tevî wê xwendekar perwerdeya xwe didomînin.

Artêşa tirkî ya dagirker û çeteyên wê ji destpêka herêm dagir kirin heta niha, ziyarên mezin digihînin qada perwerdeyê. Ji ber sûcên dewleta tirkî ya dagirker û çeteyên wê, bi dehan dibistanên li nêzî eniyên şer hatin girtin, bi hezaran şênî ku di nav de xwendekar jî hene, koçber bûn. Herwiha artêşa Tirkî ya dagirker û çeteyên wê bi dehan dibistan kirine cîyên leşkerî. Dibistana gundê Gozliyê yê li rojavayê navçeya Til Temir û beramberî rîya M4, di demekê de ku xetera êrişan dagirkeriya tirkî pir zêde ye, pêşwaziya bi dehan xwendekarên gundê



NY: Kiryarên li bakurê Sûriyê digihin asta sûcên şer

Komseriya Bilind ya Mafên Mirovan ya NY fikarên xwe ji ber raporên li ser kiryarên li herêmên bakurê Sûriyê yên çeteyên Tirkîyê dagir kirin anî ziman û got, ev kiryar digihin asta sûcên şer.

Berdevka fermî yê Komîseriya Bilind ya Mafên Mirovan ya Neteweyên Yekbûyî (NY) Ravina Shamdasani, di civîneke çapemeniyê de got, raporên bifkar li ser bûyerên revandina sîvilan, di nav de karmendên mirovî jî herêmên di destê "Tehrîr El-Şam (Cebhet El-Nusra ya berê) ketine destê me.

Shamdasani, diyar kir ku komseriyê agahiyên "Pir bifkar" derbarê bûyerên darvekirina girtiyarên piştî "dadgehkirina" ku komên çete bi rêxistin dikan, girtine. Berdevka fermî yê Komîseriya Bilind ya NY'yê got, agahî li ber destê komiseriyê hene ku çeteyên "Tehrîr El-Şam" gelek girtiyar, di nav de QSD û hêzên hikumeta Şamê jî hene bi tewana "Kufir, zina, dizî û kuştinê" darve kirine. Herwiha diyar kir ku di qanûna mirovî ya navneteweyî de cezayên darvekirinê bê biryara dadgehê ya pêşî qedexe ye û got, darvekirinê bê van şertan digihin asta sûcên şer.

KJK: Li dijî qirkirina jinê em jina azad û civaka azad biparêzin û jiyana azad ava bikin!

Koordînasîyona KJK'ê têkildarî Roja Cîhanî ya Têkoşîna Li Dijî Tundiya Li Ser Jinan deklarasyonêk belav kir û got, "Dem hatiye ku em li dijî faşîzmê, dagirkeriyê û şideta li ser jinan, têkoşîna xwe bikin yek."

Koordînasîyona KJK'ê têkildarî (25'ê Mijdarê) Roja Cîhanî ya Têkoşîna Li Dijî Tundiya Li Ser Jinan deklarasyonêk weşand û got, "Maneya sereke em didin 25'ê Mijdarê ev e. Bi tundî û qirkirina jinê geşbûna desthilatên faşîst-nijatperest-populîst zêde diibe."

Koordînasîyona KJK'ê di deklarasyonê de ev tişt diyar kirin: "Em di serdemê şerê pergale yê navlênebûyî de dijîn. Li dijî jinê rewşeke şer heye ku nehatiye ragihandin, nav lê nehatiye kirin. Em di wê serdemê de ne ku tundiya bavixsalarî derketiye meydana. Her roj bi serdan jin ji hêla mêr ve têne kuştin. Her deqê taciz û tecawiz li ser jinê dibe. Her kêlî tundî li ser bi hezaran jin dibe. Ti kana ve tundiye de ya li ser jinê, hişmendîya mêtînger-bavixsalar heye ku jinê dike milk. Ev hişmendîya ku xwe bi rengê pergala gerdûnî rêxistinî kirîye, li hemû qadên jiyane her dem li dijî jinê, tundiya fizîkî, cinsî, derûnî, aborî, dijîtal û bi giştî tundiyeke avanî hildiberîne. Ji ber vê tenê bi têkoşîneke radikal a li dijî hişmendîya bavixsalar û zayendiya civakî mirov dikare pêşî li ve tundiye bigire. Ji 5 hezar salan û vir ve ye tundiye li ser me heye ku her diçe zêdetir bêhnê li me diçikîne, bi qirika me girtiye. Bes e! Dema wê ye ku em tundiye ji ra hilqetînin!

Her ku em ber bi 25'ê Mijdarê 2020'an ve diçin divê em berxwedana jinan ku maneya xwe dane wê rojê bi bir bînin. Patrîar, Mînerva û Marîa Teresa Mirabal ji beriyar niha bi 60 salî li bo ku dixwazin Komara Donîmîkê jî faşîzmê azad bikin tedişikîyan, hatin qetilkirin. Ew ji bo ku li dijî dîktatoriya Trujillo bûne parçeyek ji berxwedana çalاک bi tundiya qebe hatin kuştin. Ji ber vê 25'ê Mijdarê, Roja Têkoşîna Dijî Tundiya Li Jinê ya Navnetewî ya ji bo bîranîna xwişkên Mirabal divê her wiha weke roja berxwedanê ya dijî faşîzmê were dîtin. Ji ber xwe qetilkirina xwişkên Mirabal, tîkiliyê di navbeyna faşîzm-tundî-dijîminatîya jinê de bi rengekî mirov nikaribe ji hev qut bike radixe ber çavan. Em KJK bi wesîleya 25'ê Mijdarê bang li hemû têkoşîna parastina jiyana azad a li çar hêlên cîhanê ya li dijî faşîzm û êrişan dagirkeriyê dikan ku berxwedana xwe bikin yek. Her wiha bi têkoşîneke rêxistinî ya yekbûyî dikare encamgir be, em dikarin

wiha desthilatên faşîst-nêr tîk bibin, ku jixwwe ev jî hev digirin, li hev xwedî derdikevin. Ji ber vê li dijî eniya faşîst a dijîminê jinê, siruştê, civakê hemû jin em eniya parastina jiyana azad rêxistinî bikin û berxwedanê geş bikin! Maneya sereke ya ku me daye 25'ê Mijdarê isal ev e. Wekî tundiya li ser jinê, qirkirina jinê hevlayên geşbûna desthilatê faşîst-nijatperest-populîst zêde dibe, naxwe li dijî faşîzm, dagirkerî û tundiya li ser jinê divê em têkoşîna xwe bikin yek. Tam dema wê ye!

LI DIJÎ QIRKIRINA JINAN DEMA JINA AZAD Û PARASTINA CIVAKÊ YE

Sendema sereke ya ku me navê



"Li dijî qirkirina jinan dema jina azad û parastina civakê ye" li pêngava xwe KJK'ê daniye ew e ku em tundiya li ser jinê weke meseleyeke civakî dibînin. Çawa ku ya ku asta azadiyê ya civakê dihyar dike asta azadiyê ya jinê be, tundiya li ser jinê bi esasi tundiya li ser civakê ye, pê civakê tê belavkirin, parçeyên bîngêhên nîrxên sereke têne pûçkirin. Ji ber vê jî bo ku pêşî li tundiye were girtin, kedxwariyê, wekneheviyê tine bike. Rêber Apo ji xwe dest pê kir û pirsgrîkê û peywir danî ber mêrê soresger, hmeû mêrên li nav civakê. Ji ber vê sedemê beriya bi 22 salan jî hêla rêxistina sûc a dewletê ya herî mezin NATO'yê ve hate revandin, hêsrîkirin û jî wê rojê li ser tê danîn, ji ber wê nêzîkatîya bêmînak a li pirsgrîka jinê

ev hate kirin. Em KJK bi wê wesîleyê careke di hêzên komploger şermezar dikin, em bang li jinên cîhnaê dikan ku destekê bidin têkoşîna azadiyê ya ji bo Rêber Apo, bibin parçeyek aktîf a vê têkoşînê.

JI BO AZADÎ Û RÊXISTINKIRINÊ XWEPARASTIN ŞERT E

Yekane rêya têkoşînê ya li dijî şideta mêr a li ser jinê, azadiya jinê û avakirina xweparastinê ye. Di roja me ya îro de ku li her qada jiyane şideta û êriş xwe kûr kirî, xweparastina jinê şer e! Divê yek jin bê parastin nemîne! Wateya wê ya din ev e; divê yek jin tenê jî bê rêxistinî nemîne! Xwe birêxistinîkirin, weke bûna

parçeyek hêza bi rêxistinîkirî dikare xweparastinê pêş bikeve, li dijî her cûre şideta rabin. Divê em wê baş bizanibin ku azadiya ferdî nîne. Em jin me kengê karî li dijî sistema mêr a serwer yekîtiya xwe ava bikin, wê demê em ê bikaribin ji êrişên mêr rizgar bibin. Yanî jî bo azadiyê azadî şert e. Bi rêxistinîkirinê dikarin azad bibin! Bi rêxistinîkirinê dikarin azad bikin! Li ser vî bîngêhî di Roja 25'ê Mijdarê Têkoşîna Navneteweyî ya li Dijî Tundiya Li Jinê em Tevgera Azadiya Jinê ya Kurdistanê bang li xwişkên xwe yên cîhanê û hevrêyên xwe dikin, di serî de li dijî faşîzm û şideta mêr bi her awayî têkoşînê hevpar bikin, eniya berxwedanê ya jinên cîhanê ava bikin. Em ji bo wê dibêjin Konfederalizma Jinan a Demokratîk a cîhanê. Li her derê, di her nefesê de li diî şideta mêr a serwer qadên jiyane yên azad ava bikin. Xweparastin jinê ya herî mezin, avakirina qadên jiyane ya azad e. Wê demê em têkoşîna ve rojê ne tenê jî bo tiştêkê, heman demê bikin sedemê bilindkirina têkoşînê jî. Li dijî qirkirina jinê em jina azad û civaka azad biparêzin, em jiyana azad ava bikin! Ji Kurdistanê bigire heta Meksîka, ji Filistinê heta Polonya, ji Emerîka heta Hindistanê û pêdetir bi hev re qir bikin; Jin, Jiyana Azadî."

Li 4 herêman qedexeya derketina derve hat ragihandin



Şaneyaya Aloziyê ya bakur û rojhilatê Sûriyê qedexeya derketina derve ya giştî li Hesekê, Qamişlo, Reqa û Tebqa ragihand. Qedexe wê roja Pêncşemê dest pê bike û 10 rojan dewam bike. R-3

Jinên rewşenbîr: Na ji şerê birakujiyê re

Jinên rewşenbîr bang li aliyên kurdî kirin ku nekevin nava şerê birakujiyê û gotin, "Na ji şerê birakujiyê re." R-3



Yê şerê navxweyî derxe nayê efûkirin

Şêwira Pêkanîna Diyaloga Neteweyî ya KNK'ê û Yekîtiya Parlamenterên Kurdistanê (KPU) ya ji bo pêkanîna diyalog û aştiyê dest pê kir. Rewşenbîr û siyasetvanên Kurd banga yekîtiya neteweyî dikin. Mezlûm Ebdê jî di şewirê de axivî û got, "Kî şerê navxweyî derxe wê Kurd wan efû nekin û wê şer bandorê li Kurdistanê tevê bike." R-4



6 hezar kes ji kampa Holê derketin û 300 kesên din jî amadekariya derketinê dikin

Jimara kesên sûrî yên bi biryara Rêveberiya Xweser û bi kefaleta şex û rûspîyan ji kampa Holê derketin, gihat 6 hezarî û 300 kesên din amadekariyê dikan ku di wê hefteya derkevin. R-6



KNK: "Divê ti kes li pêşiya yekîtiyê nebe asteng"



Di wê dema dawî de tevger û daxuyaniyên Partiya Demokratîk ya Kurdistanê (PDK) bûn sedema aloziya di navbera wê û Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK). Têkildarî ve aloziyê Gelê Kurd bertek nişan û ket nava tevgerê. Hem gel hem siyasetvan nêrîna wan ew e ku ew alozî dikeve xizmeta dijîminên gelê Kurd û pêkanîna planên wan. Ji ber wê di wê pêvajoya hesas de yekîtiyeke siyasî pir giring dibînin. R-4

Li cîhanê nêzî 60 milyon kesî bi koronayê ketine



Li cîhanê zêdetirî 57 milyon kesî bi koronayê ketine û jimara kesên mirin gihatiye nêzî milyonek û nêvê. R-5

Şevbiwêrk bi jinên ciwan xweş dibe



Tevgera Jinên Ciwan ya Bajarê Helebê ji bo 25'ê Mijdarê Roja Têkoşîna Li Dijî Tundiya Li Ser Jinê şevbiwêrka hunerê li dar xist. R-7

Li 4 herêman qedexeya derketina derve ya giştî li Heseke, Qamişlo, Reqa û Tebqa ragihand. Qedexe wê roja Pêncşemê dest pê bike û 10 rojan dewam bike.

Şaneya Aloziyê ya bakur û rojhilatê Sûriyê qedexeya derketina derve ya giştî li Heseke, Qamişlo, Reqa û Tebqa ragihand. Qedexe wê roja Pêncşemê dest pê bike û 10 rojan dewam bike.

Şaneya Aloziyê ya Meclisa Rêveber ya bakur û rojhilatê Sûriyê biryara jimara 198'an da. Li gorî biryarê li Heseke, Qamişlo, Tebqa û Reqa derketina derve qedexe ye. Qedexe 26'ê Mijarê heta 5'ê Kanûnê ye. Navaroka biryarê wiha ye: "Li herêma Heseke, Qamişlo, Tebqa û Reqa biryara qedexeya derketinê ya giştî ji bo 10 rojan hatiye dayin. Qedexe sibeha roja Pêncşemê 26'ê Mijdara 2020'an dest pê dike heta 5'ê Kanûna 2020'an dewam dike. -Di dema qedexeyê de li tevayiya herêmên Rêveberiya Xweser

dibistan, zanîngeh û baqeyên zarokan tên girtin. -Tevgera basan û bolmanan ji bo hatin û derketina ji herêmên Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rohilatê Sûriyê tê rawestandin û tevgera ji bo bazirganiyê didome. -Tevayiya sazî, daîreyên giştî yên li herêmên qedexekirî tên girtin, daîreyên xizmetgûzariyê tenê vekirî dimînin. -Di dema qedexeyê de, avayiyên rêveberiyê û dibistanên li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê tên dezenfektekirin. -Divê saziyên ragihandinê we-

latiyan şiyar bikin ku tedbîrên xweparastinê bigirin û rêgeza dûrketina civakî bikin beşek ji jiyanê xwe ya rojane. -Biryara qedexeyê ne ji bo nexweşxane û firneyan e. Lê dermanxane li gorî listeya nobedariyê ya deste, komîteyên tenduristiye û yekitiyên dermansazan tê birêxistin. -Tevgera cotkaran û belavkirina sotemeniyê li welatîyan wê were hêsan kirin. -Divê Hêzên Ewlekariya Hundir li gorî biryarê tedbîrên qedexeyê pêk bînin."



4 zarokên efrînî bi mayîna çeteyên DAİŞ`ê bi giranî birîndar bûn

Li kantona Şehba mayînek ji bermayiyên çeteyên DAİŞ`ê bi 4 zarokên efrînî de teqiya. Di teqînê de zarok bi giranî birîndar bûn.



Diyar Bekir (9), Nebî Bekir (15), Nazmî Bekir (13) ku ew her sê birayên hev in û lawê apê wan Qaziqlî Bekir (13). Zarokên birîndar birin Nex-

weşxaneyê Avrîn ya li navçeya Şehba. Xebatkarên tenduristiye diyar kirin ku birînen zarokan kûr in û dibe ku seqet bimînin.

QSD`ê beşeke din ji girtiyan radestî rûspiyan Şedadê kir

QSD`ê beşeke din ya girtiyan berda û radestî rûspiyan navçeya Şedadê kir. Li ser banga şêx û rûspiyan navçeya Şedadê ya kantona Heseke, Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD), roja Yekşemê 23 girtiyan ji bajarok û navçeyên Dêzor û Mergedayê berdan. Piştî îsbat bû ku girtiyan



li dijî şivîlan kiryarên kuştinê nekirine hatin berdan.

Ji fermandarên Meclisa Leşkerî ya Dêzorê Cesûr Amûdî diyar kir ku girtî li ser daxwaziya şêx û rûspiyan, piştî diyar bû ku destê wan di sûcên kuştina şivîlan de nîne, hatin berdan. Girtiyan ji rûspiyan re diyar kir ku ti nêzikatiyên nebaş û tundî li dijî wan nehatine kirin.

QSD`ê li herêma Dêzorê 5 çete girtin

QSD`ê li gundewarê Dêzorê 5 çete girtin û gelek cebilxane û alavên teknîkî jî desteser kirin.

çete hatin girtin û gelek cebilxane û alavên teknîkî jî hatine desteser kirin.

Lê QSD`ê têkildarî nasnameyên çeteyên hatin girtin û ka girêdayî kîjan alî ne, agahî belav nekirine.



Li gorî agahiyan Navenda Ragihandinê ya Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) weşand, yekîneyên taybet bi hevkarîya hêzên Koalîsyona Navneteweyî li herêma El-Herce û El-Ezba yên li gundewarê Dêzorê du operasyonên hevbeş kirine. Navenda ragihandinê diyar kir ku di her du operasyonan de 5

YPG: Li Heseke 4 endamên şaneyên veşartî hatin girtin

Navenda Ragihandinê û Çapemeniya YPG`ê ragihand ku di operasyona YAT`ê ya roja Pêncşemê li rojevayê herêma Heseke dest pê kirî de 4 endamên şaneyên veşartî hatine girtin.



girtin jî ev in: Hatem Salih El Kreis (endamê şaneyê veşartî ya rejîma Sûriyê ye û têkilîya wî bi DAİŞ`ê re heye) Ehmed Mihemed El Kreis (endamê şaneyê veşartî ya rejîma Sûriyê ye) Uday Salih El Kreis Samî Mihemed El Kreis Herwiha di vê operasyonê de miqdarê cebilxane û amûrên teknîkî jî hatine desteser kirin."

Şênîyên Reqa şervanekî Liwa Şemal ya Demokratîk spartin axê

Şênîyên Reqa cenazeyê şervanê Liwa Şemal ya Demokratîk Ebdurehman Dîbo bi merasimeke girseyî li Goristana Şehîdan ya li gundê Hikumiyê yê li bakurê Reqa veşartin.

Sûriyê ji êrişan, silav kir. Herwiha soza şopandina riya şehîdan heta pêkanîna armancên gel dan. Piştî axaftinan, hevseroka Meclisa Malbatên Şehîdan ya Reqa Hîbe El-Ebdullah wesiqeya şehadeta şehîd xwend û radestî malbata wî kir. Paşê girseya gel cenazeyê şehîd veşart.

Di merasima li goristanê de piştî rêzgirtinê, bi navê Partiya Sûriya Paşrojê serokê şahê Ildîbê Tirkî Dedûî û bi navê Liwa Şemal fermandar Arif Asfer axivîn. Axaftvanan rola şervanên QSD`ê ji bo parastina herêmên bakur û rojhilatê



Li Tirbespiyê Pêşketina werzişê

Li bakur û rojhilatê Sûriyê pêşketineke pisporî ya werzişê heye.

Li navçeya Tirbespiyê pêşketineke berbiçav ya futbolê ji avakirina yarîgeh, damezrandina dibistanên futbolê û tîmên jinan heye. Bi hevkarîya ciwanên li derveyî wêlat, li navçeyê û bi hevkarîya Yekîtiya Werzişê ya Cizîrê, 10 yarîgeh li navçeya Tirbespiyê hatin avakirin. Li aliyekî din jî li navçeyê 2 dibistanên futbolê hatin avakirin; Dibistana Biratî û Dibistana Ce-rah ya perwerdekirina zarokan li ser futbolê. Herwiha tîmeke taybet ya jinan li gundê Til Şeîra yê girêdayî navçeya Tirbespiyê hat avakirin. Rahênerên pispor çavdêriyê li tîma jinan û dibistanên futbolê dikin. Ciwanên navçeyê listika xwe bi turnuyên birêxistin kirî dibînin. Hin turnuya bi riya meclisa ciwanan ya navçeyê û hin jî bi awayekî gelêrî tên lidarxistin û

bi dehan ji tîmên ji pêkhatiyên herêmê ji Kurd, Ereb û Suryan beşdar dibin. Îsal zêdetirî deh turnuya li navçeyê bi hevkarîya Desteya Werziş û Ciwanan ya herêma Cizîrê û meclisa ciwanên navçeyê hat lidarxistin. Endamê rêveber yê Dibistana Biratî ya futbolê ya perwerdekirina zarokan li ser futbolê Hesen Tahir diyar kir ku di çend salên borî de li navçeyê pêşketineke berbiçav di futbolê de çêbû. Tahir got, "Di salên borî de, turnuya bi beşdariya çend tîman dihat lidarxistin, lê belê îro pêşketineke mezin li ser asta vekirina turnuyên werzişê li gund, bajar û navçeyan bi beşdariya bi dehan ji tîman hene. Herwiha her gundek yan jî du gund tîmeke xwe çêkirine û beşdarî turnuyên dibin." Listikvanê tîma Heval Yasir



Zehredîn Hisên jî got, "Di salên borî de tîm ji çend listikvanan pêk dihat û yarîgeh jî kêm bûn.

Lê îro bi dehan yarîgeh û bi seborî de tîm ji çend listikvanan pêk dihat û yarîgeh jî kêm bûn.

ya pêşketina listika futbolê bi serkeftî pêk tê. Hisên diyar kir ku xewna wan

Li Helebê 86 xwendekaran bawernameyên zimanê kurdî girtin

Li Helebê, Komîteya Perwerdeya Civaka Demokratîk (KPC-D) bi şahiyekê bawernameyên 3 astan yê zimanê kurdî li 86 xwendekaran belav kirin.



Şahî li hola Efrînê ya li taxa Şiqêf bi beşdarbûna endamên saziyên sîvil, nûnerên partiyan siyasî û malbatên xwendekaran hat lidarxistin. Di şahiyê de 35 xwendekaran bawernameyên asta yekê, 15 xwendekaran yên asta duduyan û 36 xwendekar yên asta sîsiyan girtin. Di şahiyê de mamosteya zimanê

kurdî Medya Elî û endama Kongreya Star Zeyneb Hesen axivîn. Di axaftinan de xwendekarên astên ziman qedandî hatin pîroz kirin û hat gotin zimanê kurdî xewna gelê Kurd bû. Ev xewna bi saya keda şehîdan û felsefeya rêber Abdullah Ocalan bû rastî û gelê Kurd bi zimanê xwe yê dayikê fêr dibe. Piştî axaftinan mamosteyan

bawername û diyarî li xwendekaran belav kirin. Xwendekarên Dibistana Şehîd Qehreman ya taxa Şexmeqsûd stiranên kurdî gotin. Şahî bi dilanê qediya.

Şevbiwêrk bi jinên ciwan xweş dibe

Tevgera Jinên Ciwan ya Bajarê Helebê ji bo 25'ê Mijdarê Roja Têkoşina li dijî Tundiya li Ser Jinê şevbiwêrka hunerê li dar xist.



Tevgera Jinên Ciwan ya Bajarê Helebê ji bo 25'ê Mijdarê Roja Têkoşina li dijî tundiya li Ser Jinê li Taxa Şêx Meqsûdê şevbiwêrke hunerê li dar xist. Di bernamêya hatî lidarxistin de gelek endam û nûnerên sazî û dezgehên sîvil amade bûn. HOLA berna me hatî lidarxistin bi wêneyê rêber Abdullah Ocalan û alên Tevgera Jinên Ciwan hatibû xemilandin.

têbikoşin û li gel her jinekê bisekinin. Jinan bi salan gelek eşên mezin kişandine ev eşên wan heta roja îro jî berdewam dikin. Herwiha du zarokên bi navê Şêrîn Elî û Kewser Ebûd yên ji Efrînê li ser Efrînê stiran pêşkêş kirin. Ji Navenda Çand û Hunerê ya Cemil Hava û Koma şehîd Vejin stiranên xwe pêşkêş kirin.

Bernamêyê bi deqeyeke rêzgirtina ji bo cangoriyên azadiyê dest pê kir. Paşê li ser navê Tevgera Jinên Ciwan Emîne Ebdo wiha got: "Li hemberî her cure tundiya emê

Dildarên çandê

Jiyan BOZO/Ronahî-Amûdê

Her wêlat bi çanda xwe tê nasîn. Di pêxistinê civakê de çand xwedîroleke girîng e. Ji bo parastina çanda civaka xwe û danasîna wê, ciwanên bakur û rojhilatê Sûriyê gavên pir mezin avêtin. Bi stiran û awazên xwe bûn dengê gelê xwe.

12 saliya xwe de min dest bi lêdana erbanê kir. Min heskirina erbanê ji hevalê xwe girt. Herwiha mamoste Hemze Şiweyîx pir alîkarî da min. Min sala 2017'an dest bi karê hunerê kir. Ez berê endamê Koma Ciwanên Hûrî bûm. Niha jî endamê Koma Agirî me."

ÇANDA ME PIR DEWLEMEND E

Mihemed Nûr Hopan axaftina xwe wiha domand: "Ez ji dengê Mihemed Şêxo pir hes dikim. Ji bo min ew mînak e. Dengê min jî xweş e. Dixwazim weke Mihemed Şêxo binavdeng bim. Çanda me pir dewlemend e. Divê her yek ji me vê çandê biparêze. Hûnera me hebûna me ye. Divê ciwanên me yê hunermend hunera xwe veneşêrin û jê şerm nekin. Emê gavbigav pêş bikevin. Çi dibe bila bibe divê em gavan paş ve neavêjin. Malbata min jî pir destekê dide min. Birayê min jî li erbanê dide. Ez hêz û morala xwe jî wî digirim. Hem dixwazim bibim şanoger, hem di mûzîka xwe de bibim mîna Seîd Yûsiv û Seîd Gabarî û stiran û awazên kurdî pêş bixim."



Hopan axaftina xwe wiha qedand: "Ji ciwanên Kurd re wiha dibêjim: "Li çana dapir û bapîrên xwe xwedî derkevin. Stiran û awazên me pir xweş in. Dive em vê çanda xwe ya pîroz li seranserê cihanê belav bikin."

Îsal wê li Kobanê 500 hezar şitlên daran werin çandin

Rêveberiya Giştî ya Jîngehê ya herêma Firatê amadekariya çandina 500 hezar şitlên daran dike.



Rêveberiya Giştî ya Jîngehê ya herêma Firatê wê îsal li Kobanê, gundewarê wê, sazî û

dibistanên wê niv milyon şitlên daran biçîne. Par li şitilgeha Miştenûr nêzi

niv milyon darên cuda hatin çandin. Ew darên hatin çandin wê îsal li kantona Kobanê û gundewarê wê werin çandin. Girêdayî mijarê, hevserokê Rêveberiya Giştî ya Jîngehê ya herêma Firatê Semîr Elî wiha got: “Xebatkarên şitilgeha Miştenûrê îsal amadekariya çandina niv milyon darên berhemdar û bêberhem dikin. Ew dar wê li dibistan, saziyan û li ser riyên bajêr bi çend merheleyan werin çandin. Li gorî Semîr Elî, cureyên darên ku wê îsal bîn çandin

ev in: Sewlî, sinober, darên xemlê; xurme, murcan, efes û darên berhemdar; hejîr, fistiqên helebî, goz û behîv. Semîr Elî axaftina xwe wiha domand: “Îsal me vekirina şitilgeha Hedato ya li bajarokê Şêran bi dawî kir û herwiha em xebata li ser vekirina şitilgeha li navçeya Qenayê dikin. Bi wê re ji li cem me 3 şitilgeh amade ne.”

Elî gotina xwe wiha bi dawî kir: “Em xebata vekirina daristanekê nû li gundê ekolojîyê dikin, ku tê de 8 hezar dar hebîn. Ew xebat ji wê li ser du merheleyan be. Di her merheleyekê de wê 4 hezar dar werin çandin.

Malbatên Sûrî yên li kampa Holê: “Ji jinên DAIŞîyan em newêrin rastiye bêjin”

Dilîn EHMED/Ronahî-Qamişlo

Piştî têkoşîneke bêhempa ya şervanên YPG-YPJ û QSDê bajarê Baxozê 14ê Kanûna 2018, ji çeteyên DAIŞê rizgar bû. Ji bo bicikirina malbatên çeteyên DAIŞê yên xwe radestî Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) kirin, Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê û rêxistinên mirovî li bajarokê Holê kampek ava kirin. Li herêma Cizîrê kampa Holê ya herî mezin e û ya herî bixeter ya li cihanê ye. Ji ber hişmendiya DAIŞê û pîrbûna koçberan, li kampê her

tim alozî û pirsgirêk derdikevin. Ji bo em ji nêz ve çirokên wan bişopînin me serdana kampê kir. Jinên DAIŞî yên li kampê çavên wan tenê xuya dikin. Bi çavê dijîmanan li me dinêrin. Xezeb ji nêrîna wan dibariya. Li aliyekî din jî gelek ji wan poşmaniye di çavên wan de xuya dikir. Jinên ji destê DAIŞîyan zerer ditîn, ji ber ku sûxurên DAIŞê li kampê hene nikarin bi rehetî biaxivin. **TIRSA ME EW E KU EM LI VÊ DERÊ BIMÎNIN** Piştî hewldanê jinekê bi navê



Welai ya ji bajarê Humsê bi tîris û bi dengekî melûl ji me re wiha axivî: “Piştî şerê Baxozê ji ber tang û topan ez û hevîjn û her du zarokên xwe, me bi zorê xwe ji nava şer derxist. Pişt re me xwe radestî QSDê kir. Di dema “dewleta islami” de jiyana me ne xweş bû. Jiyana em tê de ti kes nekeviye. Lê niha em li vê derê pir kêfxweş in.”



Ji ber ku jinên DAIŞî li me kom bûn, Welai newêrî çiroka xwe bidomîne. Ji ber wê çû mijareke din û axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Niha navên malbatên Sûrî yên ji herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê qeyd dikin. Ji ber ku em ji Humsê ne em ditirsîn ku li vir bimînin. Em bang li rêxistinên mirovî dikin ku çareyekê ji me re ji bibinin.”

Li navçeya Girkê Legê basên gel dest bi xizmetê kirin

Ajokarên teksiyan ji bo her neferî 200 lîreyên Sûriyê digirin. Ji ber wê şûniyên Girkê Legê giifname pêşkêşî Şaredariya Gel kirin. Li ser wê şaredariyê jî basên gel diyar kirin. Teksiyan taybet yên li navçeya Girkê Legê heqê neferran ji navçeyê heta bajarokê Rimêlanê bilind kirin. Ji bo her neferî 200 lîreyên Sûriyê digirin. Vê barên welatiyan giran

kir, ji ber wê bang li Şaredariya Gel kirin ku basên gel ji wan re peyda bikin. Piştî ku Komîteya Şaredariyan ya kantona Qamişlo banga welatiyan erê kir, bas hatin peydakirin. Şaredariya Gel ya navçeya Girkê Legê du basên gel diyar kirin. Her basek 22 neferran radike. Bihayê her kartekê 100 lîreyên Sûriyê ye. Her du bas wê di navbera Girkê Legê û Til Ewar de bixebitin. Bas heta

hefteyekê peran negirin û ji bo zarok û kal û pîran wê her tim bê pere bin. Şaredariya Gel ya Girkê Legê 9 basên gel diyar kirine û wê ji Qada Azadiyê ya rojhilatê navçeyê heta gundê Til Ewar yê rojavayê bajarokê Rimêlanê bixebitin. Ji ber ku li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê ji ber vîrûsa korona qexdexeya kêrketina derve hatiye ragihandin, destpêkê wê

bas ji saet 7ê sibê heta 3'yê êvarê kar bikin. Li gorî Şaredariya Gel dema qexdexa rabe, wê her du bas rojane 12 saetan kar bikin angî ji saet 7ê sibê û heta 7ê êvarê. Welatiya bi navê Şemis Hedad ya ji gundê Til Ewar ji hundirê basa gel axivî û got em bi basên gel kêfxweş in, lewre xizmeta navçeya Girkê Legê dikin û barê welatiyan sivik dikin.



Pişt re peyamên pîrozbayîyê hatin xwendin. Kongre bi hilbijartina 9 endamên rêveber yên Meclisa Komeleya Parêzvananê Reqa yên ji birîndaran şer yê Reqa bi dawî bû.



Dostê gelên bê dewlet Willy Kuijpers: Têkoşîna bê navber û bê sînor

Derwêş M. FERHO

Di sala 1977 de ez li Leuven bi cî bûm. Li wira 12 xwendekarên ji Başûr hebûn. Heta dawîya 1978ê bi wan re xebata Kurdistanî dikir. Ew xwendekar bi alikariya Willy Kuijpers burs stendibûn û amadekariya xwendina zanîngehê dikirin. Di dawîya 1978 de, ji sedemên cuda, bi çend hevalên din re me Yekîtiya Karker û Xwendekarên Kurd li Beljîka –Têkoşer, bîngehê Enstîtuya Kurdî ya Brukselê ava kir. Di wê navberê de min Willy Kuijpers nas kir û heta îro dostaniya me domand.

Wê demê li welêt, zor û zilma li ser Kurdistanê bi hemû dijwariya xwe dibû. Koçberî, zindan, kuştin, tehdîd û înkara bi milyonan Kurd li nav her çar dewletên dagirker... Di qada navneteweyî de bêdengî, raya giştî kerr û la le. Siyasetmedarê Flaman Willy Kuijpers, parlementer e. Xwedî ramanekê berfereh, dirozkan û mirhovhez. Li cem xebata xwe ji bo doza Flamanan ji gelên bê dewlet re her tim amadeyê alikariyê ye. Ji 1971 heta 2016, wek endamê Parlemanto, senator, endamê Parlemantoya Ewropa, endamê meclîsa Leuven û şahredarê bajarê xwe Herent kar kiriyê. Ji sedemên nexweşiya xwe karê parlemeterî û şahredariyê berdi-de. Lê ji bo îdealizma pê bawer heta roja dawîya jiyana xwe didome. Deriyê mala wî her tim ji her kesî re vekiribû.

Di warê civakî de Willy Kuijpers mirhovhezekî mezin bû. Li ser pirsgirêkên civakî hassas û alîkar bû. Ji feqîran re, ji kesên pêdiviya alîkarî hebe amade bû. Ji bo wê jî her tim li çareseriyên digera û peyda dikir. Mînak, wî gelek zarokên bêxwedî li mala xwe bi cî dikir. Du zarokên wî hebûn. Pênc heb jî ji derve wek zarok ji xwe re adabte kiribû. Di 1977 de xortekî Başûrî, paşê ji keçeke Kurd, disa ji Başûr demêk dirêj li ba xwe xwedî kiribû.

Willy Kuijpers bi salan li pey hev gelek çarûn Kurdistanî û ji têkoşîna Azadiya Kurdistan re bû dost, alîkar. Bi polîs û hêzên taybetî re li Bakur çendîn car rû bi rû ma, ew tehdîd kirin, heta kete xetera kuştinê. Di dema cenazeyê Wedat Aydin de, di nava alozî û hêrişên polîsê Turk de ji mirinê filitî. Yek ji berên demaça polis di devê otobûsê de li ber sere wî ket. Di dema hevdişînekê bi waliyê dewleta Turk Ûnal Erkan re munaqeseyeke diwar dike. Wali jê dixwaze ew terka alîkariya terorîstan bike. Bersiva wî “yê ku terka tiştêkî bike hûn in, çi karê we di nava milkê Kurdistanê de heye?”

Di dema hêrişên rejîma BAAS de ew şev û roj ji bo alîkariya Kurdistan li qadan bû. Di siyasetê de, Li mala xwe, bi munasebetên cuda li nav kom û rêxistinên din di nava çalakîyan de amade bû. Du mînak ji wan xebatên heja ji ku di nav de bû, di 1992 de, me bi hevra 27 kamyonên alîkariyê ji penaberên Kurdên Başûr re şandin ser sînor. Bi dehhezaran penaber ji Başûr hatibûn Bakur, di kampê de bûn. Çend sal pey re me derfêten avakirina 5 gundên ji aliye Şaddam hatibûn wêrankirin peyda kir û ew alîkarî bi rê ya saziya KRO çû Başûrê Kurdistan. Di dema hêrişên komên faşîstên Turkan li ser Enstîtuyê ew li kêleka me rawaşt. Şewirdariya xwe ji me qut nekir. Ev mirhovê mezin di roja 17.11.2020 de çû ser dilavoniya xwe. Koça wî ji bo me Kurdistan hundakirina dostekî heja ye.

Jinên rewşenbîr: Na ji şerê birakujîyê re

Jinên rewşenbîr bang li aliyên kurdî kirin ku nekevin nava şerê birakujîyê û gotin, “Na ji şerê birakujîyê re.”

Jinên Yekîtiya Rewşenbîran li Herêma Cizîrê, Komîteya Wêjeyê ya Rojavayê Kurdistanê û Rabîtiya Jinên Rewşenbîr, têkildarî aloziya li Başûrê Kurdistanê daxuyaniyek li baxçeyê Xwendinê ya bajarê Qamişlo dan.

Daxuyanî ji aliye Heseroka Yekîtiya Rewşenbîrên Herêma Cizîrê Anahîta Sîno ve hat ragihandin.

Jinên rewşenbîr dan zanîn ku destkeftiyên ku berê ji bo wan xeyal bûn û îro bi dest wan ketine, divê wan biparêzin. Herwiha diyar kirin ku dijminên Kurdistan dixwazin li ser hesabê Kurdan plansazî û berjewendiyên xwe pêk binin. Jinên rewşenbîr di berdewamiya daxuyaniya xwe de wiha gotin: “Em jinên rewşenbîr, bang



li wijdana Kurdistanê dikin ku bi ti behaneyan nekevin nava şerê birakujîyê. Lewre wê Kurd ji vî şerî windayîyeke mezin bidin û destkeftiyên xwe ji dest bidin. Ji ber wê pêwîst e ku em li pêşberî van hewldanên ku hilweşandin û tînekirina destkeftiyên me dikin hedef, bêdeng nemînin û qebûl nekin.”

Herwiha diyar kirin ku ew jî beşek ji wê neteweyê ne ku bawariya wan bi edaleta doza Kurdî heye. Ji ber wê gelek berdêl dane û hê jî didin. Di dawîya daxuyaniyê de, jinên rewşenbîr gotin, “Na ji şerê navxweyî re. Na ji şerê birakujîyê re.”

Bi rengê jina azad mafê jinan biparêzin

Dilîn EHMED/Ronahî-Qamişlo



Çîrokê 25'ê Mijdara 1960î bi kuştina her sê xwişkên Mîrabel dest pê kir. Ew roj bû Roja Têkoşîna li Dijî Tundiya li ser Jinê. Piştî wê bûyarê ji bo bîdestxistina mafê xwe jinan dest bi têkoşîn û berxwedanê kir. Ji bo bîdestxistina mafê xwe bi hezarê salan e jin bi her awayî li ber xwe dide. Li rojavayê Kurdistanê bi destpêkirina şoreşê re -ku bi navê şoreşa jinê hat pênasekirin-, jinên bakur û rojhilatê Sûriyê bi taybetî jinên Kurd, bi têkoşîna xwe di qada civakî, leşkerî, çandî, siyasî, dîplomasi û hwd. de çîh

xwe girtin. Jinan bi berxwedana xwe ji cihanê tevê re, nişan da ku jin jiyane û bê wê jiyane nabe.

TEVÎ ZEHMETIYAN LI DIJÎ TUNDIYÊ LI BER XWE DIDE Bi pêmana 25'ê Mijdarê Roja Têkoşîna li Dijî Tundiya li ser Jinê, jinên bakur û rojhilatê Sûriyê, bi rengê jina berxwedêr çalakîyan li dar dixin. Li ser wê mijarê Endama Koordînasyona Kongreya Star Rihan Loqo ji rojnâmeye me re wiha axivî: “Ji ber ku azadiya jinan mirina nijadperestiyê ye, her tim dibin hedefa dijîman û desthilatdaran. Roja Têkoşîna li Dijî Tundiya li ser Jinê, ji bo me xwedîwateyê girîng e. Di vê rojê de em bi daxuyanî, semînan û çalakîyên cuda dadikevin qadan. Herwiha em di çalakîyên xwe de, ji jinan re didin xuyakirin bê çawa destkeftiyên

şoreşê û nasnameya jina azad biparêzin û têkoşînê pêş bixin. Ji ber ku jin desthilatdarî û tundiyê napejirîne her tim dibin hedefa êrişên zilam û civakê.”

BI ÇAV Û DILÊ JINAN LI JIYANÊ BINÊRIN Rihan Loqo axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Xa bi guhertina hişmendiya bavkîsalarî û desthilatdaran, bi destpêkirina şoreşê re jinan bi têkoşîn û xebata xwe roleke girîng lîst. Rêstîstina jinê Kongreya Star jî di qada perwerdeyê de heta astekê bandorekê erênî li civakê kir. Jin ne di rojekê de gihîştê wê astê. Ji bo jiyaneke azad bi hezaran jinan canê xwe feda kir û heta roja me ya îro jî li hemberî zehmetiyan li ber xwe didin. Jin jiyane, jin dayik e, jin xwişk e û ji bo civaka xwe kedê dide. Ji bo wê banga me ji civak û malbatê re ew e ku rêzê ji keda wê re bigirin.”

Li Dêrikê gavek ji bo piştgiyariya aboriya jinan

Bi armanca pêkanîna rêgeza xwetêrkirinê û peydakirina derfêten kar ji malbatên gundên Dêrikê, Kongreya Star ji endamên xwe re 15 hektar ji bo çandina genim û 15 hektar ji bo çandîniya demsalf diyar kirin. Endamên Kongreya Star tovê genim û sebzeyên demsalf ji Komîteya Rêveberîya Zeviyana ji girêdayî Şirketa Pêşxistina Civa-

ka Çandîniyê ya Dêrikê girtin. Kooperatîf ji 7 jinên ji bajarokê Eyn Dîwar pêk tê. Weciha Temo ya çavdêriya projeyê dike ji got, “Ji bo her endamî 375 hezar lîreyên Sûriyê ji bo kirina genim, derman û semad dane. Rûbera ji bo çandîniyê hatî diyarkirin, 30 hektar e, 15 hektar ji go genim, 15 hektarê din ji bo sebzeyan e.”

Beşdareke projeyê ya bi navê Ayşe Xalid diyar kir ku Kongreya Star şaxê Dêrikê alîkariya jinan dike da ku pêdiviyên xwe pêk binin. Gelek jinên ji Dêrikê beşdarî kooperatîfê çandîna sebzeyên zivistan û havînê bûn. Bi van projeyan pêdiviya sûkê ya sebze û hwd. ji berhemên herêmê yê demsala borî, peyda dibe.

YPJ: Emê tola Berfîn û hevriyên xwe yên şehîd hilînin

Fermandariya Giştî ya YPJ'ê bi daxuyaniyeke nivîskî şervana YPJ'ê Berfîn Rizgar bîr anî û soza standina tola şehîdan nû kir.

18'ê Mijdarê li eniya Ebû Sîra ya ser bajarokê Eyn Îsa, şervana YPJ'ê Berfîn Rizgar di topbarana çeteyên dewleta tirkî ya dagirker de şehîd bû.

Fermandariya Giştî ya Yekîneyên Parastina Jinan (YPJ) li ser şahadeta şervana xwe daxuyaniyeke nivîskî weşand û tê de wiha got:

“Em hevriya xwe Berfîn Rizgar bi rêzdarî bîr tînin û sersaxiyê ji malbata wê ya heja û welatparêz re dixwazin. Em careke din soza rakirina tola wê û ya tevayîya hevriyên xwe yên şehîd nû dikin. Hevala me Berfîn çawa ku li Kobanê û li Dêrezorê di eniyên herî pêş yên cengê de bû, herî dawî di eniya Ebû Sîra ya ser bajarê Eyn Îsa de jî di çeperên herî pêş de parastina welatê



xwe û gelê xwe dikir û li ser erkê xwe tevî karwanê şehîdan bû.

Emê bi ruhê hevriya xwe Berfîn li erkên demê xwedî derkevin û dîlsoziya xwe ya bi hevriyên xwe yên şehîd re raber bikin. Em jî dibêjin Dem Dema Azadiyê ye, pêwîst e em hemû ji bo wê demê seferber bibin û welatê xwe, zimanê xwe û pergala xwe ya neteweya demokratîk bi rengekî xurtir ava bikin û biparêzin.”

“Emê bi perwerdeyê tundiya li ser jinan bi dawî bikin”

Endamên meclîsên jinan û Kongreya Star diyar kirin ku tundî li dijî jinên bîrexistinkirî tê kirin û gotin, emê bi perwerdeyê tundiya li ser jinan bi dawî bikin.”

Bi pêmana 25'ê Mijdarê Roja Cihanî ya Têkoşîna Li Dijî Tundiya Li Ser Jinan ya Cihanê, endamên meclîsên jinan û Kongreya Star ji ANHA re axivîn û gotin, perwerde û zanist çekên sereke ji bo rêgirtina li tundiyê ne.

Endama Komîteya Perwerdeyê ya Meclîsa Jinên Azad ya Şehba Hemîda Xidro diyar kir ku di dehsalên aloziya Sûriyê û şer de, herî zêde jinan para xwe ji tundiyê girtiye û banga berxwedanê li jinan kir.

‘EM HER TIM HEWL DIDIN JINAN PERWERDE BIKIN Û TUNDIYÊ BI DAWÎ BIKIN’ Endama Kongreya Star ya navçeya Şedadê Rehêf El-Elî diyar kir ku tundî bi cureyên xwe yên fîzîkî, cînsî û derûnî, her wiha bi astengkirina jin û zarokan xuya dibe. Rehêf El-Elî da zanin ku tundî encamên xerab bi xwe re tîne û dibe sedema hilweşîna malbatê.”

Ayat Îbrahîm jî diyar kir ku tundiya li ser jinan hê dewam dike û got, sedema wê adetên civakê ne ku bi zêhniyeta bavkîsalarî dibin. Her wiha diyar kir ku tundî bandoreke neyînî li jinan, malbat û civakê û ji wê zêdetir li zarokan dike. Menar El-Îlêwî jî got, dema cahîtiyê bi dawî bû, divê civak girîngiya rola jinan nas bike û ji rêbazên ku heqaretê li jinan dikin û rola wê piçûk dixin dûr bikevin. Herwiha got, divê ji bo bidawîkirina tundiyê kar were kirin.



kirin, bînsaziya herêmê wêran kirin. Ev zêhniyet di mejiyê zilam de maye.

Zehra Kalo di dawîya axaftina xwe de got, “Em nabêjin jin hemû azad bûne û tundî li ser wan nayê kirin, lê em hewl didin beşên din perwerde bikin da ku ji tundiyê xelas bibin. Ji jinan tevan tê xwestin ku xwe bî rexistin bikin.”

‘EM HER TIM HEWL DIDIN JINAN PERWERDE BIKIN Û TUNDIYÊ BI DAWÎ BIKIN’ Endama Kongreya Star ya navçeya Şedadê Rehêf El-Elî diyar kir ku tundî bi cureyên xwe yên fîzîkî, cînsî û derûnî, her wiha bi astengkirina jin û zarokan xuya dibe. Rehêf El-Elî da zanin ku tundî encamên xerab bi xwe re tîne û dibe sedema hilweşîna malbatê.”

Ayat Îbrahîm jî diyar kir ku tundiya li ser jinan hê dewam dike û got, sedema wê adetên civakê ne ku bi zêhniyeta bavkîsalarî dibin. Her wiha diyar kir ku tundî bandoreke neyînî li jinan, malbat û civakê û ji wê zêdetir li zarokan dike. Menar El-Îlêwî jî got, dema cahîtiyê bi dawî bû, divê civak girîngiya rola jinan nas bike û ji rêbazên ku heqaretê li jinan dikin û rola wê piçûk dixin dûr bikevin. Herwiha got, divê ji bo bidawîkirina tundiyê kar were kirin.

KNK: “Divê ti kes li pêşiya yekîtiyê nebe asteng”

Diîn EHMED/Roanhi-Qamişlo



Di vê dema dawî de tevger û daxuyaniyên Partiya Demokratîk (PDK) bûn sedema aloziya di navbera wê û Partiya Karêrên Kurdistanê (PKK). Têkdarî vê aloziyê Gelê Kurd bertek nişan û ket nava tevgerê. Hem gel hem siyaseta van nêrîna wan ew e ku ev alozi dike xizmeta dijminên gelê Kurd û pêkanîna planên wan. Ji ber wê di vê pêvajoya hasas de yekîtiyeke siyasî pir girîng dibînin.

taybîyên cuda hene, bêguman wê li pêşiya yekîtiyê nakokî derkeve. Divê aliyên siyasî tev li gorî wê tev bigerin. Berî du salan KNK li ser mijara yekîtiyê xebitî. Lê ji bo piştgiyariya banga Fermandarê Giştî yê QSD'ê Mezlûm Ebdê me xebata xwe sekinand. Ji bo yekîtiyê du qonaxên hevdiînan serkeftî derbas bûn û bawer dikim wê qonaxên din jî serkeftî derbas bibin. Divê em derfetê nedin ti kesî yan jî ti partiyên ku li pêşiya yakîtiya neteweyî bibin asteng.”

EV NÊRÎN E NE DIJBERÎ YE Li ser daxwaziya ENKS'ê ku li dijî zimanê kurdî û sîstema hevserokatyê ye, Ekrem Hiso got, ev daxwaziya wan nêrîn e, ne dijberiya zimanê dayikê ye û wiha dewam kir: “Di nêrîna min de ti kes ne li hemberî zimanê xwe ye. Em û Fermandarê Giştî yê QSD'ê Mezlûm Ebdê hewl didin ku minhaca Kurdî bi awayekî fermê bê qebûlkirin.” Li ser aloziya dawî yê di navbera her du aliyên siyasî de, Hiso

“TI KES NIKARE LI PÊŞIYA YEKÎTIYA NETEWÊYÎ BIBE ASTENG” Li ser mijarê Endamê Desteya Rêveber ya Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) Ekrem Hiso, ji rojnâmeya me re wiha axivî: “Piştî deh salan ji şoreşa Rojava û guhertina li erdenîgariya Kurdistanê, ji bo parastina destkeftiyên şoreşê, yekîtiya neteweyî pir girîng e. Ji ber ku li her parçeyê Kurdistanê

axaftina xwe wiha domand: “Di demên dawî de gotina “birakujî” tê bihistin. Ez bixwe ne bi vê gotinê re me. Li sûna wê em dikarin bêjin nelhevkirina her du aliyan li ser hin xalan. Lewre di fikirê her du aliyan de, kuştin nîne. Piştî van destkeftiyên û deh salên şoreşê, bawer nakim Kurdên me şerê hev bikin.” Endamê Desteya Rêveber ya Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) Ekrem Hiso axaftina wiha bi dawî kir: “Ji bo rizgariya her çar parçeyên Kurdistanê, divê aliyên siyasî tev hinekî ji ya xwe werin xwarê. Em Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) ne afgirên ti partiyên in. Çi li rojava, çi li başûr, çi li bakur û çi li rojhilat, ji bo çareseriyê pirsgrêkê em ji tevan re dibin alîkar. Li ser vî bingehî em çalakî û xebata xwe pêş dixin. Di dawiyê de banga me ji gelê Kurdistanî re ew e ku bi nêrînek rast û durist li van nakokiyên binêrin. Dilxwazên welatê xwe bin û ji bo nêrîneke hevbeş bibin alîkar.”



Ahmet AKTAŞ

Ti şik û şubhe nînin ku gelê me, ji xwe Yekîtiya xwe ragihandiye û bi lezgîni, ji hemû tevgerên me yê siyasî jî, heman Yekîtiyê dixwaze. Lê mixabin hinek tevgerên me vê bangê û vîyanê nabinin, an jî bi hişmendî lê nabin xwedî û jê dûr di-revin. Her du hilweştî jî malxerabî ye. Hema yekser em du minakan nişan bidin. Yek jê piraniya tevgerên me yê Bakurê Kurdistanê, li Amedê dicivîn û bi dengê bilind, li gor daxwazên gelê xwe tevdigerin û Yekîtiya xwe radigihin. Her serkeftibin. Mînaka duduyan mînaka ENKS'ê ye û mixabin di nava hilwešta neyinî de ne û li goreyî daxwaz û îradeya gelê xwe tevnagerin, li goreyî siyaseta dewleta Receb û Bahçelî tevdigerin. ENKS û tevgerên me yê din ên Rojava hemû dikarin biçin parçeyên din, biçin Hewlêrê, biçin Qendilê ya jî cihêkî din, li gel tevgerên Kurdîstanî bicivîn, danstandinê bikin û piştgiyê jî hev bixwazin. Ev daxwaza gelê me ye jî ku tevgerên her parçeyî û hemû parçeyan bi hev re bidin biştînin û yekîtiyek hin mezintir a NETEWÎ jî ava bikin. Piştî ev îradeya yekîtiya netewiya xurt pêkhat, êdî li ser vê çarçoveya berjewendî netewî, tevgerên me dikarin li gel dewletan û hêzên biyanî jî danstandinê û diplomasiyê bikin. Lê mixabin, hêj di depêka vê hewldana yekrêziyê de, hilwesata neyinî ya ENKS'ê diyar dibû. Her digotin “bila dewlet bikevin navbêna me ji bo lêvegêra me” û hwd. Heta aslêkê ev daxwaz nehat redkirin û xebata Yekîtiyê meşiya. Lê ji ber hîlbijartinên DYE'yê, niha xebat rawestîya. Belê hilwešta neyinî ya xerabtir û nayê pejirandin, hilwešta li gel dewleta dagirker a Tirka ye. Ji xwe hêj roja despêkê ya lihevruştina yekemîn bû, Çavuşoglu, hilwešta xwe ya dujinkarî û dijberiya wê tevgêra Yekîtiyê, tund nişan da. Ji xwe ya cihê mixabîniyê ye, nûnerên Sihanok Dîbo bang li ENKS'ê kir ku li hesabên xwe vegere û li rola Kurdan ya li Sûriyê binere. Lewre roleke sereke dilîzin.

Sîhanok Dîbo: Serdana ENKS'ê ya Tirkîyê bixeter e



Nûnerê MSD'ê yê li Misirê Sihanok Dîbo bal kişand ser serdana ENKS'ê ya Tirkîyê û got, “Ev serdan ne li gorî şert û qonaxên diyalogên kurdî-kurdî ye.” Dîbo diyar kir ku rola Tirkîyê li herêma bixeter e û ji ENKS'ê xwest li hesabên xwe vegere. Tevî ku di lihevkirina kurdî-kurdî

de heta astekê pêşketin çêbûbe, lê ENKS careke din astengiyan derdixe û şertê rakirina meteryalên bi zimanê kurdî tîne. ENKS heman demê beşek ji “Eniya Aştî û Azadiyê ye” ya ku Tirkîya piştgiyariya wê dike. Berî çend rojan jî di nava vê eniyê de serdana Tirkîyê kir. Nûnerê Meclisa Sûriya Demokratîk (MSD) yê li Misirê Sihanok Dîbo diyar kir ku gelek dewletan hema hema li hev kiriyê ku rola Tirkîya lawaz bikin û got, çawa di vê qonaxê de hin aliyên di nava kom û koalîsyona berê de dikarin beşên nû çêkin! Divê were zelalkirin ku beşek

ji “Eniya Aştî û Azadiyê” ango partiyên ENKS'ê halê hazir bi Partiya Yekîtiya Niştîmanî Kurdî re diyalogên têkildarî serweriya Sûriyê ku ew bixwe jî diyalogên Kurdî-Kurdî ne li dar dixin.” Dîbo da zanîn ku serdana ENKS'ê ya Tirkîyê ne li gorî qonax û pîvanên diyaogên Kurdî-Kurdî ye. Dîbo diyar kir ku sedema sereke ku ku diyalogên kurdî-kurdî tînin astegkirin destwêrdana Tirkîyê ya di aloziya Sûriyê de ye û got, dewletên erebî û Yekîtiya Ewropa diyar kirin ku rola Tirkîyê li gelemperiyê herêma bixeter e û zêde bûye û divê were lawazaki-

rin.” Sihanok Dîbo her wiha got, li gorî hin siyasetmedaran, meşed ji gava lawazkirina rola Tirkîyê pêvajoya piştî Trump e. Dibe ku ji ber wê Tirkîya ji herêman ku li Sûriyê dagir kirine, vekişe. Herwiha bi dehan raporên navneteweyî hene tê de piştrast dibe ku çeteyên bi navê Artêşa Niştîmanî ya Sûrî sûcên dermîrovî kirine.” Di dawiyê de Nûnerê Meclisa Sûriya Demokratîk yê li Misirê Sihanok Dîbo bang li ENKS'ê kir ku li hesabên xwe vegere û li rola Kurdan ya li Sûriyê binere. Lewre roleke sereke dilîzin.

Mihemed Ebas: Me ENKS li ser girêdana wê ya bi dewleta tirkî ya dagirker ve şiyar kir

Sekreterê Giştî yê Partiya Kombûna Kurdistanê Mihemed Ebas, ENKS têkildarî girêdana wê ya bi dewleta tirkî ya dagirker ve şiyar kir û bang lê kir ku tîkiliya xwe bi Rêveberiya Xweser re xurt bike. Ebas bingehê tîkiliya di navbera ENKS'ê û dewleta tirkî de rexne kir û got, “PDK jî pêşxistin û xurtkirina tîkiliyên di navbera ENKS'ê û dagirkeriya tirkî de, berrîsiyar e.” Ebas axaftina xwe wiha domand: “Ti caran tîkiliyên baş di navbera Kurdan û dewleta tirkî ya dagirker de pêk neha-

tine. Dewleta tirkî hemleyên qirkirinê li dijî Kurd, Ermen û Suryenan didomîne û li dijî wan pêkhatayan qirkirina etnikî dike.” **EBAS ENKS JI GIRÊDANA BI DEWLETA TIRKÎ VE ŞIYAR KIR** Girêdayî hewldanên wan Yê jî bû dîrxistina Encûmena Niştîmanî ya Kurdî li Sûriyê (ENKS) jî dewleta Tirkî ya dagirker, Ebas wiha got: “Me gelek caran partiyên ENKS'ê şiyar kirine ku xwe ji girêdana bi dewleta tirkî ve xelas bikin.

Lewre ji şerê cîhanê yê yekî heta niha dîroka dewleta tirkî bi xiyaneîta li dijî Kurd û Kurdistanê tê nasîn.” Ebas herwiha da zanîn ku Partiya Demokratîk ya Kurdistanê (PDK) hewl dide tîkoşîna gelê Kurd bixwe xizmeta berjewendiyên Tirkîyê û wiha got: “Me Mesûd Barzanî û PDK şiyar kirin ku tîkiliyan bi dewleta tirkî re pêş nexin. Lê mixabin, PDK û ENKS guh nedan şiyariyên me. Partiyên ENKS'ê jî tişteki ku xizmeta berjewendiyên gelê Kurd bike, nekirin. Ya ji bo parastina vê



xakê şehîd dayîn û hê jî dide, Rêveberiya Xweser e.” Ebas di dawîya axaftina xwe de bang li ENKS'ê kir ku helwesta xwe ya danîna tîkiliyan bi dewleta tirkî re, careke din di ber çav re derbas bike û li gel û partiyên kurdî vegere. Lewre di hedefa dijminê de Kurd tev hene.

‘Kî şerê navxweyî derxe wê Kurd efû nekin’

Mazlûm Ebdê li Şêwira Pêkanîna Diyaloga Neteweyî ya KNK'ê û Yekîtiya Parlamenterên Kurdistanê (KPU) axivî û got, “Kî şerê navxweyî derxe wê Kurd wan efû nekin û wê şer bandorê li Kurdistanê tevê bike.”

Şêwira Pêkanîna Diyaloga Neteweyî ya KNK'ê û Yekîtiya Parlamenterên Kurdistanê (KPU) ya ji bo pêkanîna diyalog û aştiyê bi hev re bixebitin, dest pê kir. Rewşenbîr û siyasetvanên Kurd banga yekîtiya neteweyî dikin. Kongreya Neteweyê ya Kurdistanê (KNK) li dijî şerêkî gengaz yê navxweyî yê ji ber siyaseta şerxwaz ya PDK'ê, ev demeke di nava hewldanan de ye. Di vê çarçoveyê de biryar hatibû dayîn ku ji bo pêkanîna diyalog û aştiyê Şêwira Pêkanîna Diyaloga Neteweyî di navbera KNK'ê û Yekîtiya Parlamenterên Kurdistanê de, were lidarxistin. Gelek siyasetvan, nûnerên rêxistinên civaka sîvil, partiyên siyasî yê Kurdistanê, rojnâmevan û rewşenbîr, nêrînan xwe anîn ziman.



Kesên tevî şewirê bûyîn, bal kişandin ser stratejiyeye neteweyî û gotin divê aliyên siyasî jî li ser stratejiyêkê kar bikin. Herwiha hate gotin ji bo çareseriyê divê desteyek ji nûnerên aliyên siyasî û rewşenbîran were avakirin û serdana rêveberên PKK û PDK'ê bikin. Fermandarê Giştî yê Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) Mazlûm Ebdê jî ji rojavayê Kurdistanê tevî bû û got, heta

niha PKK û PDK'ê pirsgrêkên xwe bi danûstandinê çareser kirine û em bawer dikin ji niha û pêve wê bi diyalogê çareser bikin.” Ebdê diyar kir ku şerêkî navbera du hêzan wê zîyanê bide Kurdistanê tevê û got, şerêkî navxweyî berî her kesî wê zerebê bide destkeftiyên Rojava. Kî dibe bila bibe Kurd û dirok wê hêza şerê navxweyî derxistî efû neke.”

Navenda Îmaratê ya Siyasetê: Tirkîye sûdê ji zindîbûna DAIŞ'ê digire



Navenda Îmaratê ya Siyasetê eşkere kir ku ku herî zêde ji vegêra DAIŞ'ê sûdê digirê dewleta tirkî ye. Navendê diyar kir ku “Vegera rêxistina DAIŞ'ê”, wê Rûsya,

Emerîka û welatên Ewropa yê ku bang li Tirkîyê dikin ku hêzên xwe ji herêman ku herî dawî li Rohîlatê Sûriyê (Girê Spî û Serê Kaniyê) dagir kirine vekişîne, mijûl bike. Ya herî girîng jî vegera rêxistinê wê Kurdan jî mijûl bike. Lewre li dijî hebûna Tirkîyê li Efrînê û herêman Rohîlatê Sûriyê şerêkî giran dikin. Navendê di lêkolînê de bal kişand ser faktorên vegera DAIŞ'ê û got, dewamkirin-

na aloziyê li Sûriya û Iraqê û gendeliyên li sazîyên ewleyiyê yê her du welatan, her wiha korona û bandora wê li welatên ku di dosya şerê li dijî DAIŞ'ê de aktîf in, dibin sedem ku rêxistina DAIŞ'ê cereke din vegere.” Li gorî lêkolînê dewletên sûdê ji vegera DAIŞ'ê digirin, dewleta tirkî, Iran û Heyet Tehrîr El-Şam in yê ku bandor li wan dibe Rêveberiya Xweser, Rûsya û hikumeta Şamê ne.



Erdogan ji çapemeniyê re diyar kir ku bi Emîrê Siûdî Feysel re bi telefonê axiviyê. Heman rojê got, em xwe di nava Yekîtiya Ewropa de dibînin. Çi bi Erdogan hat heta ku li emîrê Siûdî digere? Çawa ku tê zanîn Siûdiyan li hemberî malê Tirkîyê biryara boykotê dabû. Hin welatên din jî yê erebî malê Tirkîyan boykot dikirin. Yê li hemberî Yekîtiya Erebî çavê xwe bilind dikir û gotinê piçûkkirinê ji wan re digotin ev Erdogan bû. Eger em binin bira xwe dema artêşa tirkî bakurê Sûriyê dagir kirî Yekîtiya Erebî li dijî dagirkeriyê derketibû. Bersiva Erdogan ev bû: “Hûn dewletên Erebî tevan kom

El Nusra jî xwe re kirin leşkerên bîpere. Ev ciwan çawa ku li hemberî Sûriyê bi kar anin, li hemberî Libya û Ermenîstanê jî dide şerkin. Bi lihevkirina bi Rûsya re Efrîn dagir kir. Bi lihevhatina bi Trump re Girê Spî û Serê Kaniyê dagir kirin. Bi serhezaran welatiyên Sûriyê li welatê xwe kirin koçber. Gef li welatên erebî tevan xwarin. Ji bilî Qeterê welatên Erebî li dijî dagirkeriya wî derketin. Di serê wan de Îmarata Erebî û Erebiştana Siûdî tîne. Misirê jî li hemberê helwesta xwe diyar kir. Libya jî got, eger di dagirkeriyê de dewam bike wê bibe egera şer. Bi dijderketina welatên erebî û dewletên weke Fransa pêşiya kompoyên Erdogan li kûrkirina şerê navxweyî hat gitiin. Erdogan heta dawiyê dewletên Ewropa xapandibûn. Bi gotina ezê reformên demokratîk bikim, ezê bibim endamê YE destêka wan standibû. Piştî ku sistemeke faşîst ava kir û hêz xist destê xwe pişt

xwe dabû YE û gotinê giran ji wan re jî gotibûn. Bi wendakirina Trump ya hîlbijartinê dest û lîngên wan li hev ketin. Dihizirin ku wê nikarin ji rêveberiya Emerika ya nû weke ya berê destêkê bigirin. Aboriya Tirkîyê di nava krîzeke kûr de ye. Berê jî welatên erebî pere diherikin Tirkîyê. Niha sekiniye. Weke din Siûdî û welatên din dest bi boykota malê wê kirine. Ev jî krîzê kûrtir dike. Weke din meha li pêşiya me wê YE li hemberî Tirkîyê li ser ambargoyê biaxivê. Erdogan jî ber ku hem li derve hem li hundir tengav bûye, dest bi lêxistina deriyê welatên erebî û Ewropa kir. Kesayet û rêbaza siyaseta wî jî ya Hitlerê faşîst ne cuda ne. Nîrxekî ku Erdogan pê ve girêdayî nîne. Hevalên wî yê bi hev re AKP ava kirin, ji wan ti kes li cem nema-ye. Bi Ergenekonê ku karê dewletê yê qirêj dîke û kontr-gerîla re itîfaq kiriyê. Dizî, talan û kurtêlxwerî

bûye exlawê vê rêveberiyê. Erdogan ferq kiriyê ku li hundir û li derve xetimiye û hatiye naskirin. Ji bo wê dîsa devê dix li ber dewletên erebî xwar dîke û dixwaze navbera xwe û wan baş bike. Erdogan xeyalperestekî Osmanî ye û kumê keçeliya wî ketiye. Artêşa NATOyê ya di destê xwe de li hemberî gelên cîran bi gefxwarinê bi kar tîne. Li dûv wî qasî ye ku Mûsil, Kerkûk û herêman din dagir bike û bi Tirkîyê ve girê bide. Ka wê bikare yan na ew mijareke din e, lêbelê hedefa wî ev e. Ji bo wê divê em li bendê bin ku wê gelê hem li hundir tengav bûye, dest bi lêxistina deriyê welatên erebî û Ewropa kir. Kesayet û rêbaza siyaseta wî jî ya Hitlerê faşîst ne cuda ne. Nîrxekî ku Erdogan pê ve girêdayî nîne. Hevalên wî yê bi hev re AKP ava kirin, ji wan ti kes li cem nema-ye. Bi Ergenekonê ku karê dewletê yê qirêj dîke û kontr-gerîla re itîfaq kiriyê. Dizî, talan û kurtêlxwerî

SOHR: Di êrişên ezmanî de li Bokemalê 14 alîgirên Îranê hatin kuştin

SOHR'ê ragihand ku di êrişên ezmanî yê li gundewarê Bokemalê de ku tê payîn Îsraîlê pêk kiribin, 14 alîgirên Îranê hatin kuştin. Navenda Çavdêriya Mafên Mirovan ya Sûriyê (SOHR) diyar kir ku balafirên tê payîn yê Îsraîlê bin, nuçteyên hêzên alîgirên Îranê yê li gundewarê Bokemalê bombebaran kirin û di êrişê de 14 alîgirên Îranê hatin kuştin. Li gorî SOHR'ê, baregehên nû yê alîgirên Îranê li wê herêmê hatin bombebarankir-



rin û di encamê de 2 navend û wesaitên leşkerî hatine roxandin. Hat diyarkirin ku balafireke leşkerî 10 êrişên ezmanî li ser baregehên li gundewarê Bokemalê yê rojhilatê Dêrezorê pêk anîne.

SOHR: Kerwanekî din yê dewleta tirkî derbasî ldlîbê bû

Navenda Çavdêriya Mafên Mirovan ya Sûriyê ragihand ku kerwanekî leşkerî yê Tirkîyê di deriyê sînorê yê Keferlosîn re derbasî ldlîbê bûye. Li gorî Navenda Çavdêriya Mafên Mirovan ya Sûriyê (SOHR), 20 wesaitên bi madeyên lojistîk û diwarên çimento barkirî, ber bi nuçteyên leşkerî yê dagirkeriyê yê li gundewarê ldlîbê ve çûne. Ji destpêka ragihandina agirbestê ve, 4 hezar û 440 wesait û bi hezaran leşkerên dewleta tirkî derbasî xaka



Sûriyê bûne. Li gorî SOHRê, ji 2'yê Sibata 2020'an heta niha hezar û 775 kamyon û alavên leşkerî yê bi tank, wesaitên veguhestina leşkeran û panzêran, halavên dij guleyan û radarên leşkerî barkirî gihîştine herêma “Kêmkirina şer”.

Li cîhanê nêzî 60 milyon kesî bi koronayê ketine

Daneyên rojane yê cîhanî yê Reuters eşkere kirin, ser 57 milyon kesî re li seranserê cîhanê bi koronayê ketine û jimara kesên mirin zêdetirî milyonek û 370 hezar kesî ye. Emerîka ku herî zêde korona lê

belav bûye, pişt re Hindistan, Îtalya, Brezilya, Fransa tîne. Herwiha ji aliyê jimara kesên bi koronayê mirin Emerîka di rêza yekê de ye, pişt re Italya, Fransa, Brezilya û Hindistan tîne.